

Naha divê her kes berpirsiyariyê bigire - dema ku rêgezên ji bo 70+ têne rakirin

Ajansa Tenduristiya Gel û hukûmet naha rêgezên ji bo 70+ ra dikin. Tevî rastiya ku enfeksiyon dîsa zêde dibe. "Naha her kes - ne tenê pîr û kal divê berpirsiyariyê hilgirin", dibêje Lena Hallengren, Wezîra Tenduristiya Gel.

Dema ku pandemiya-Korona belav bû, pîr kes hewceyê parastinê pîr zêde bû. Ji bo mirovên ji 70 salî mezintir (70+) û kesên ku nexweşî hene, ji Korona (covid-19) nexweşketin pîr zirartir e.

Ji ber vê yekê, sînardarkirin ji bo wan zehf zêde bûne. Ew ê kesên din nebînin û ew ê di her warî de baldar bin. Wekî din, nehiştin ku hûn biçin û serdana li nexweşxane an xaniyan bikin.

Lê gelek mirovên pîr re serdemek zehf dijwar derbas kirin û xwe pîr tenê hîs kirin. Ew fêm kiri bûn ku ew nikarin derkevin derve û pîr li malê mane. Ji nebûna jiyaneke civakî pirsgerêkên wan ên derûnî hene.

Lê naha Daîreya Tenduristiya Giştî dibêje ku divê ji bo her kesê civakê yek rêzik hebin. Yê kal û pîran jî. Ecêb xuya dike

dema ku nuha enfeksiyon zêde dibe û dev ji sînokirinê berdin.

Lê pîr kes di civakê de dizanin ku divê hûn di karsazî û deverên din de ji pîr û kalên xwe dûr bisekinin. Bi vî rengî, pîr dikarin beşdarî civatê bibin û wek mînakî bi hevalên ku bi tevahî saxlem in re hevdiştinê bikin û biçin meşê.

"Divê em li tenduristiya gişkî binêrin", wiha dibêje Anders Tegnell li Daîreya Tenduristiya Gel. "Naha kal û nexweş bi xwe nikarin wê berpirsiyariyê hilgirin. Naha divê her kes bibe alîkar".

Ji ber vê yekê jî rêgezên "karantîna malbatê" pîr girîng dibe. Hemî mezinên ku bi hev re dijîn ger yek ji wan têt kiri bo û Korona pêra hebe divê her kes li malê bimînin.

Zarokên tendurust yê ku diçin pêşdibistan an dibistana seretayî (salkurs 1-9) divê biçin dibistanê. (Mezinekî saxlem ku nîşanên Korona li wî tune, dibe ku zarokan bibê, bîne û dûv re dîsa here malê.)

Naha her weha her wîlayetek dikare sînorên xwe danînin, meclîsên giştî yê herêmî saz dike.

"Ger ew hewce bibe, hûn dikarin li hemî an deverên herêmekê rêgezan hişktir hebin," dibêje Lisa Labbe Sandelin, bijîşkek kontrolkirina enfeksiyonê li wîlayeta Kalmar.



Agahdarî her du hefteyan

Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkarîyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêvebiriya wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de hene. Dema krîzê di nav civakiyê de em bi hev re biryaran didin û bi hevûdu ra alîkariyê dikin.



VÄSTERVIKS
KOMMUN



facebook.com/krissamverkan.kalmar